Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :423 nameronahi@gmail.com 30- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Çend wêne ji jiyana Efrîniyên li Şehbayê

**Piştî ku Efrîn bi piştgiriya dewletên weke Rûsya û hêzên din yên navnetewî ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê de hat dagirkirin, gelê Efrînê neçar ma ku dev ji mal û milkê xwe berde li Şehbayê bi cih bibe. Niha jî di bin şert û mercên zehmet yên jiyanê de li ber xwe dide. Ji bilî saziyên Şehbayê ti saziyeke navnetewî alîkariya wan nake.**

**Lê tevî hemû zehmetiyan û bê derfetiyan jî şêniyên Efrînê li Kampa Berxwedan a li kantona Şehbayê li hemberî şert û mercên zehmet berxwedana xwe didomînin, rêxistina xwe ji nû ve saz dikin û bi hêviya vegera li Efrîna azad in.**

**Bi deh hezaran şêniyên Efrînê niha li Şehbayê li kampên Berxwedan û Serdem li hemberî şert û mercên zehmet li ber xwe didin û xwe bi rêxistin dikin. Lê hêviya wan a vegera li welatê xwe jî mezin e.**













Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 423 30 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Gêrîla li Colemêrg û Amedê lê da



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê derbarê çalakiyên gêrîla de agahî parve kir û diyar kir ku li navçeya Licê ya Amedê 8 leşker hatine kuştin. Her wiha HPG'ê da ragihand ku li Amed û Mêrdinê di şer de 6 gêrîla jî şehîd bûne.*R-2*

# DAWIYA DAGIRKERAN LI EFRÎNÊ NÊZÎK E

*Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên xwe li Efrînê ji derveyî hemû pîvanên mirovî û exlaqî, her wiha bi kîn û dijminahiyeke mezin tevdigerin. Dagirker Efrînê talan dikin û dişewitînin. Her wiha rojane bi dehan mirovan direvînin, êşkence dikin û dikujin.*



## 11 DAGIRKER HATIN KUŞTIN

Şervanên YPG'ê li Efrînê bi çalakiyên bi bandor derbên giran li dagirkeran dixin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê li ser çalakiyên 26-27'ê Tîrmehê yên li dijî hêzên dagirker daxuyaniyek da û ragihand ku 11 leşker û çeteyênd dewleta Tirk hatine kuştin. Daxuyaniyê de hate ragihandin ku hejmara leşker û çeteyên hatine kuştin bû 2538. *R-2*

## DARÊN ZEYTÛNAN DIŞEWITÎNIN

Leşker û çeteyên qirker û dagirker bi talankirin, kuştin, êşkence û revandinê namînin, xwezaya Efrînê jî dişewitînin. Çete û leşkerên dagirker li gundê Hec Hesna ê girêdayî navçeya Şiyê ya Efrînê bi sedan darên zeytûnan şewitandin. Hat ragihandin ku şewat gihiştiye geliyê nêzî gund û her diçe li herêmê belav dibe. *R-2*

## LI EFRÎNÊ XEBATÊN KONTRA

Fermandariya Giştî ya YPG'ê, bi daxuyaniyekê ragihand ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê di hundirê Efrînê de cilê şervanên wan li xwe dikin û bi navê YPG zextê li ser gel dikin, mal û milkên wan talan dikin û xebatên kontra dimeşînin. YPG'ê bang li gelê Efrînê û hemû raya giştî kir ku li hember van dek û dolaban hişyar û baldar bin. *R-5*

## Em ê rê nedin ku axa me bê dagirkirin



Bi dehan endamên Yekitiya Ciwanên Rojava yên ji bajarê Hesekê li dijî dagirkeriya Tirk meşek lidarxistin û dagirkerî şermezar kirin. Ciwanan diyar kir ku çalakiyên wan heta ku hemû herêmên bakurê Sûriyê û başûrê Kurdistanê ji dagirkeriya tirk werin rizgarkirin wê dewam bike. *R-5*

## Pêngava Azadiya Ocalan tê destpêkirin

Kongreya Star amedekariyên destpêkirina pêngava 3'emîn ya Azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dide destpêkirin. Endama Rêveberiya Kongreya Star Zehra Berkel diyar kir ku ew ê di 2'yê Tebaxê de bi awayekî fermî dest bi çalakiyan bikin. Zehrayê got, "Emê têkoşîna xwe ya ji bo azadiya rêber Apo berdewam bikin." *R-3*

Kongreya Star

## HSM'ê buroya xwe li Helebê vekir

Partiya Sûriyê ya Pêşerojê piştî ku damezrandina xwe ragihand, xebatên xwe yên rêxistinkirinê berdewam dike. Partiya Sûriyê ya Pêşerojê piştî bajarê Hesekê, buroya xwe li taxa Şêxmeqsûd a Helebê jî vekir. Gelek sazî û nûnerên partiyan beşdarî merasîma vekirina buroyê bûn. Di merasîma vekirinê de girîngiya hevgirtina gelên Sûriyê hat ziman. *R-5*

## MŞD'ê ji bo 3'ê Tebaxê bang kir

Meclîsa Şengalê ya li Derveyî Welat bi wesîleya salvegera 4'an a Qirkirina Şengalê daxuyaniyeke nivîskî weşand û bang li welatparêzan bi taybetî civaka Êzidî kir ku tevlî çalakiyên protestoyî ku wê bi pêşengiya Sîwana Meclîsên Jinên Êzidî li 8 herêman werin lidarxistin, bibin. *R-4*




## Destûra Bingehîn bê me nabe



Berpirsyarê Komîteya Têkiliyên Derve ya TEV-DEM'ê Salih Muslim li ser hevdîtina heyeta MSD'ê ya bi rêjîma Sûriyê re diyar kir ku mesele bi hevdîtinekê çareser nabe û wiha got, "Ji bo her du aliyan tê wateya hewldana ji bo fêhmkirina niyeta baş û afirandina baweriya bi hev." Muslim destnîşan kir ku destûreke bingehîn ya ku bê avakirin jî bê hêzên Bakurê Sûriyê nabe." *R-4*

## Divê sûdê ji ezmûnên Rojava bigirin



Endamê Rêxistina Kurdistan a Hizba Komunîsta Îranê Komala Enwer Elî derbarê nakokiyên navxweyî yên Îranê de diyar kir ku ew li dijî destwerdanên derve ne û wiha got, "Divê sûdê ji ezmûna Rojavayê Kurdistanê bigirin. Divê Kurd ji bo mafê xwe timî têkoşînê bikin û xwe bi rêxistin bikin." *R-4*

## Raporeke sosret dan Sisê Bîngol



Jina bi navê Sîsê Bîngol ku temenê wê 76 salî ye li girtigeha Tirkiyê de tê girtin. Nexweşxaneya dewletê raporeke sosret da Sîsê Bîngol. Ji bo Sîsê Bîngol ku nexweşiyên wê yên gurcik, tansiyona bilind, û nexweşiyên diyabetê hene, got, "Mayîna wê ya di girtîgehê de metirsiya jiyanî çênake." *R-3*

# Li Efrînê 11 dagirker hatin kuştin

***Şervanên YPG'ê li Efrînê bi çalakiyên bi bandor derbên giran li dagirkeran dixin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê li ser çalakiyên 26-27'ê Tîrmehê yên li dijî hêzên dagirker daxuyaniyek da û ragihand ku 11 leşker û çeteyênd dewleta Tirk hatine kuştin.***



YPG'ê diyar kir ku li Efrînê di encama çalakiyên wan de 11 leşker û çeteyên dewleta Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê li ser çalakiyên 26-27'ê Tîrmehê yên li dijî hêzên dagirker daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin:
"Hêzên me roja 26'ê Tîrmehê li cihekî navbera gundên Basilê û Gobelê yên navçeya Şêrawayê li dijî artêşa Tirk a dagirker çalakiyeke sabotajê kirin. Di encamê de 5 leşkerên di wesayita zirxî de bûn hatin kuştin û wesayita leşkerî jî hate rûxandin.
Roja 27'ê Tîrmehê hêzên me li dijî dagirkerên li navenda bajarê Efrînê çalakiyeke sabotajê pêk anîn. Di encama çalakiyê de 5 çeteyên ku qaşo navê 'polîsê leşkerî' li xwe kirine û leşkerek hatin kuştin.
Yekîneyên me heman rojê li gundê Qeretepe yê Efrînê li dijî artêşa Tirk û çeteyên wê çalakiyek kirin. Li ser encama vê çalakiyê agahiyeke zelal bi dest neket."

**HEJMARA KUŞTIYÊN DAGIRKERAN: 2538**

Di dawiya daxuyaniyê de hate ragihandin ku bi çalakiyên dawî re hejmara leşker û çeteyên artêşa Tirk a dagirker ên ji destpêka êrîşên dagirkeriyê ve hatine kuştin bû 2538.

## Gêrîla li Colemêrg û Amedê lê da



Gerîlayên HPG'ê li Lîcê li leşkerên Tirk xistin û di encamê de 8 leşker hatin kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla daxyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin: "24'ê Tîrmehê saet 23:50'î, li herêma Omerya ya navçeya Nisêbîn a Mêrdînê, di navbera yekîneyeke me ya bi erka xwe radibû û artêşa tirk a dagirker de şer derket. 3 hevalên me yên derbên giran li hêzên dijmin xistin, bi lehengî şer kirin û şehîd bûn.

**8 LEŞKERÊN TIRK LI LICÊ HATIN KUŞTIN**

21'ê Tîrmehê saet 00:30'î, hêzên me li dijî bendeke kontrolê ya li nêzî gundê Kijilnehîzê yê navçeya Licê ya Amedê çalakiyek kirin. Ji nêz ve li benda kontrolê hate reşandin û kulûbe bi temamî rûxiya. Bi qasî ku hate tespîtkirin 8 leşkerên dijmin hatin kuştin.
Hevalê me Aram ku di çalakiyê de bi canbexşane li dijî hêzên dijmin şer kir û bi giranî birîndar bû, ji bo bi saxî nekeve destê dijmin, bombeay xwe bi xwe ve teqand û şehîd bû. Artêşa TC a dagirker piştî çalakiyê termên leşkerên xwe û ên birîndar bi gelek wesayitên zirxî ji herêmê rakir.
18'ê Hezîrana 2018'an saet 00:30'î artêşa TC a dagirker li derdora gundê Bektaş ê navçeya Hênê ya Amedê dest bi operasyonê kir. Ji ber operasyonê di navbera hêzên me û artêşa TC a dagirker de şer derket. Artêşa TC a dagirker bi balafirên şer bombe li qada operasyonê barand. Ji ber bombebaranê hevrêyên me Koçer û Roger şehîd bûn.

## Tecrîd li bajarên Ewropa hate şermezarkirin

Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li bajarên Marsîlya û Toûloûse yên Fransayê û li bajarê Dusseldorf ê Elmanyayê hate şermezarkirin. Bi vê armancê meş hatin organîzekirin.
Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û êrîşên dagirkerî û qirkeriyê yên dewleta Tirk ên li Efrînê û Başûrê Kurdistanê bi meş û xwepêşandanan hatin şermezarkirin.
Li bajarê Marsîlya yê Fransayê, girseya gel li meydana Canebîere li hev civiya û heta meydana Vîeûx-Portê meşiya.
Girseya gel pankarta bi nivîsa "Azadî ji Ocalan re" vekir û dirûşma "Azadî ji Efrînê" qirkiya. Çalakgeran tilîlîû û dirûşman êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li Rojava û Başûrê Kurdistanê şermezar kirin. Di dema meşê de gelek belavok hatin belavkirin.
Di dawiya meşê de li meydana Vîeûx-Portê mîtîngek hate lidarxistin. Qisekeran ji Kurdistaniyên li Ewropayê xwestin ku destekê bidin pêngava rizgarkirina Efrînê û gotin, Efrîn wê teqez ji nû ve bibe parçeyek ji Kurdistanê. Mîtîng bi qîrîna dirûşman qediya.




## 7 çeteyên DAÎŞ'ê hatin kuştin



Hêzên ewlekariyê yên Iraqê li wîlayetên Diyala û Selahaddînê 7 çeteyên DAÎŞ'ê kuştin.
Li gorî daxuyaniya Navenda Çapemeniyê ya Ewlekariya Iraqê, li navçeya Samra ya wîlayeta Selahaddînê, di operasyona dijî çeteyên DAÎŞ'ê de 4 çete hatin kuştin. Li bajarokê Cezîrê jî çeteyekî DAÎŞ'ê bi saxî hate girtin.

**LI DIYALAYÊ 3 ÇETE HATIN KUŞTIN**

Alîkarê Fermandarê Operasyona Diyalayê Hesen Mihemed got, li Diyalayê di operasyonê de 3 çeteyên DAÎŞ'ê hatine kuştin. Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku operasyon li navçeyên Encane û Sîndî yên herêma Memrînê hatiye meşandin û 3 çete hatine kuştin.



## Dagirker xweza Efrînê dişewitînin

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyê wê yên ku êrîşên qirker û dagirkeriyê yên li ser Efrînê dike, vê carê jî xwezayê qetil dike.
Çeteyan li gundê Hec Hesna ê girêdayî navçeya Şiyê ya Efrînê bi sedan darên zeytûnan şewitandin.
Artêşa Tirk û çeteyên wê yên dagirker li gundê Hec Hesna ê girêdayî navçeya Şiyê ya Efrînê bi sedan darên zeytûnan şewitandin.
Qetlîam, talan, destdirêjî û destavêtina artêşa Tirk û çeteyên wê ya li ser welatiyên sivîl ên Efrînê ji bo guhertina demografiya herêmê bê navber dewam dike. Vê carê jî artêşa Tirk û çeteyan berê xwe da dîrok û qetilkirina xwezaya herêmê. Çeteyan bi sedan darên zeytûnan ên li gundê Hec Hesna a girêdayî navçeya Şiyê ya Efrînê şewitandin.
Çavkaniyên herêmî ragihandin ku şewat gihiştiye geliyê nêzî gund û her diçe belavî herêmê dibe.

## DYA'yî bi dizî bi Talîbanê re hevdîtin kir

Li gorî îdîaya rojnameya New York Timesê, rêveberiya DYA'yê bi rengekî dizî bi Talîbanê re hevdîtinek kir.
Li gorî nûçeya ji aliyê rojnameya New York Times ve hate weşandin, nûnerên Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA) û Talîbanê, li Qatarê bi rengekî dizî li hev rûniştin.
Li gorî îdîaya rojnameyê, nûnera taybet a başûrê Asyayê ya DYA'yê Alîce Wells û gelek dîplomatên Amerîkî, hefteya bihûrî bi du nûnerên Talîbanê re rûniştin.
Rojnameyê di nûçeya xwe de îdîa kir ku li ser qedandina şerê navxweyî yê li Afganîstanê hatiye axaftin û diyar kir ku Wezareta Karên Derve ya DYA'yê negotiye ku ev hevdîtin derew e. Di brîfîngeke çapemeniyê ya wezaretê de hatibû gotin ku Alîce Wells serdana Qatarê kiriye.
Ji rayedarên Afgan Ataûllah Salîm jî diyar kir ku haya wî ji hevdîtineke wiha nîne, lê hevdîtinên bi vî rengî divê werin kirin.
NYT'ê beriya çend hefteyan ragihandibû ku Serokê DYA Donald Trûmp hin dîplomatên payebilind wezîfedar kiriye ji bo yekser bi Talîbanê re rûnên.
Rêveberiya DYA'yê heta niha li dijî hevdîtina bi Talîbanê re bû.





# Gerîla çanda dengbêjiyê didomîne

***Dengbêjî di wêje û mûzîka kurdî de xwedî cihekî girîng e. Qîmete dengbejiyê niha hê zêdetir tê fêhmkirin. Gerîla jî dengbêjiya ku di mûzîka kurdî ya kevnar de xwedî wateyeke cuda ye, zindî dike û didomîne. Gerîlayê bi navê Dozger jî di nava refên gêrîla de vê çandê didomîne.***



Gerîla Dozger, çanda dengbêjiyê ku cihekî xwe yê taybet di dîroka Kurdan de heye, li nava refên gerîla didomîne.
Dengbêj hem dîrok û zimanê civaka xwe diparêzin, hem jî nûnerên herî mezin ên çanda devkî ne. Bi taybetî li herêma Serhedê dengbêj Şakiro, Evdalê Zeynikê, Kerapetê Xaco û hwd. çanda civaka Kurd hatiye parastin. Dengbêjî û klam, li herêma Serhedê bi Evdalê Zeynikê bi rengekî resen derkete pêş û li tevahiya erdnîgariya Mezopotamyayê belav bû. Nifşên ku piştî Evdalê Zeynikê gihan, berevajî dengbêjên beriya xwe ku bêyî amûrekê distiran, êdî mey jî bi kar anîn.
Gerîla Dozger jî yek ji wan e ku dixwaze çanda dengbêjiyê bidomîne. Bi dengê xwe yê ji dil, li çiyayên azad dengbêjekî azad e.
Gerîla Dozger diyar kir ku dengbêj ji bo ji ziman û çanda xwe dûr nekevin, bi dengbêjiyê dîrok timî zindî kirine û got, "Li dijî kujerên ku dixwazin zimanan ji holê rakin, Kurdan hem bi dengbêjiyê, hem jî bi çîrokên xwe çanda xwe parastine."
Gerîla Dozger destnîşan kir ku dengbêjiya çanda Kurd bi taybetî li herêma Serhedê didome û got, "Yek ji sedemên herî mezin ên parastina zimanê me, dengbêjî ye. Kir ku em heta nvê serdemê zimanê xwe biparêzin û bigihînin vê rojê. Hêzên kujer di herikîna dîrokê de gelek mirov ji cih û warên wan koçber kirin û bi qedexekirina zimanê wan ew ji holê rakirin. Dema ku ziman ji holê rabe, netewe jî ji holê radibe. Dengbêjî ji bo parastina çandê bi rola herî mezin rabûye. Dengbêjî bi hestên kûr tê kirin. Stranên ne yên me, bi heman hestê nayên gotin. Ji ber ku klamên em bi ziman û çanda xwe tînin ziman, hestên me nîşan didin."…*ANF*

## Kevana Zêrîn çalakiyên hefteya çandê destpê kir



Çalakiyên hefteya çandê ku ji aliyê Tevgera Kevana Zêrîn hatiye organîzekirin, bi şahiyekê li gundê Aqîbê yên navçeya Şêrawa ya Efrînê dest pê kir.

Tevgera Kevana Zêrîn a Efrînê bi armanca vejandina çanda Efrînê û têkbirina planên dewleta Tirk û çeteyên wê ku hewl didin çanda herêmê bihelînin çalakiyên hefteya çandê da destpêkirin.

Çalakiyên hefteyê bi şahiyekê li çiyayê Lêlûnê li gundê Aqîbê yê navçeya Şêrawa dest pê kir.

Bi sedan şêniyên navçeyê tev li şahiyê bûn. Cihê şahiyê bi alavên kevin û wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hate xemilandin.

Piştî rêzgirtinê, rêvebera Tevgera Kevana Zêrîn a Efrînê Rûmet Beko axivî û anî ziman ku artêşa tirk a dagirker û çeteyên wî Efrîn dagir kirin û bi her cureyên pêkanînan dixwazin çanda herêmê bihelînin.

Rûmet Beko destnîşan kir ku armanca hefteya çandê vejandina çand û kevneşopiya herêmê ye û hêvî kir ku di demeke nêzî dikin vegerin Efrîna azad.

Piştî axaftinê, Koma Şehîd Silava a Stranan bi stranên xwe yên şoreşgerî gelekerî li gel tilîliyên dayikan beşdar coşand.

Her wiha koma Şehîd Viyan Soran jî ya dîlanan bi dengê def û zerneyê dilanên pêşkêş kir.

Paşê jî, şanoyeke bi navê "Dil û Mejî" hate pêşkêşkirin. Mijara şanoyê; derketina şêniyên Efrînê ji ber êrîşên tirkiyê ber bi Şehbayê ve, lê dilê wan bi Efrînê re ye, lê difikirin ku tevî bala wan li ser Efrînê ye lê ew neçarin xwe ji êrîşan biparêzin û ji herêmê derkevin. Di dawiya şanoyê de, vegera li war pêk tê.

Di dawiya çalakiyê, koma "Serdem" a zarokan stranên şoreşgerî gotin, şênî jî li ber xelekên dîlan gerandin û bi dirûşmeyan Berxwedana Serdemê silava kirin…*ANHA*

## Li ser helbestê panel hat dayîn

Li navenda Çand û Huner a navçeya Til Hemîs a ji bo pêşxistina fikrên ciwanan û pêşxistina çanda herêmê panelek bi navê "Helbest şaneya ku çanda gelan vedibêje" hate lidarxistin.
Panel li navenda Çand û Huner a navçeya Til Hemîs hate lidarxistin.
Hejmareke ji helbestvanên herêmê tev li panelê bûn. Panel bi armanca pêşxistina fikrên ciwanan û vegerandina çanda Ereb hate lidarxistin.
Bi sedan şêniyên herêmê û endamên saziyên sivîl û leşkerî beşdarî panelê bûn.
Helbestvan Hemdî El-Ezo, Macid Hisên El-Xilêf, Mihemed El-Rewîsî, Fewaz El-Nezal, Mahir El-Hisên, Hind El-Necris, Mehmûd El-Helûş û her wiha zarokên bi navê Ala El-Etîb û Lemiya El-Elî jî tev li panelê bûn.
Di panelê de bi navê navenda Çand û Hunera navçeya Til Hemîs Sayil El-Muxlif axivî û bi xêr hatina beşdaran û helbestvanan kir.
El-Muxlif di axaftina xwe de diyar kir ku ew weke navenda Çand û Huner hewl didin çanda gelan û civakê pêş bixin û wiha got,"Em dikarin bi yekîtiya xwe bi beşên rewşenbîr re çanda xwe li herêmê pêşbixin da ku bibe neynika gelan."
Paşê helbestek bi navê "bav" ji aliyê zaroka bi navê Ala El-Etîb û helbestek bi navê "dayîk" ji aliyê Lemiya El-Elî hatin xwendin.
Paşê her helbestvanekî bi rengê xwe helbestên xwe yên cûda xwendin.
Di dawiyê de endamên Meclisa bajarokên Ekaz û Cezaa hinek ji çanda Erebî ya resen a êla Şemer gotin.
Panel bi stranên gelerî ji aliyê Endamê navenda Çand û Huner a Til Hemîsê Mehmûd El-Zahir ve bi dawî bû…*ANHA*

## Berxwedanê bi wêneyan nîşan dide



Erdelan Îbrahîm ji zarokatiya xwe ve ji hunera şêwakariyê hez dike û dibe şêwakar. Li welatên xerîbiyê zor û zehmetiyan dikişîne, herî dawî li warê xwe Rojava vedigere û cihê xwe di berxwedana Efrînê de digire.
Erdelan Îbrahîm ji navçeya Bilbilê ya Efrînê ye. Ji zarokatiya xwe ve ji hunera şêwekariyê (wênesazî) hez dike û bi demê re xwe fêr dike.
Jiyana Îbrahîm bi êş û azaran tijî bû. Nebaşbûna rewşa madî ya malbatî ew neçar kir ku di zarokatiyê de bixebite da ku alîkariya malbatê bike, li gel kar jî xwendina xwe berdewam kir. Lê astengiyên ku li pêşiya wî bûne kelem, jê re bû zemîn ku azaran bi rêya şêwekariyê parve bike.
Jiyana hunerî ya Erdelan Îbrahîm bi rêzkirina wêneyan dest pê dike.
Îbrahîm ku ji ber astengikirina wêneyên wî ji aliyê rêjîmê de neçar dimîne ji Sûriyê derdikeve û diçe Lubnanê û Urdinê, 23 salan li derveyî welat dimîne.
Bi pêvajoya Şoreşa Rojava re, Erdelan Îbrahîm vedigere welatê xwe, Erdelan bi alîkariya 9 şêwekarên din wêneyekî mezin yê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi qasî 1200 metrekare çêkir.
Bi êrîşên dewleta tirk a dagirker yên li ser Efrînê re Erdelan jî berê xwe dide Şehbayê û li vir karê xwe didomîne…*ANHA*



## Parastina Nasnameya Kurdistanî

Derwêş M. FERHO

Zimanê dayikê nasnameya merov di nava xwe de diparêze. Civaka zimanê xwe bi awayekî hunda dike dikeve nava xetereke têkçûnê. Civakên ku zimanekî din bi gemelemperî di jiyanê de bi kar tînin dibin esîrê nasnameyek din. Ji aliyekî din, parastina nasnamê di her şert û mercan de li ciyên ku zimanê dayikê rola xwe nelîze jî pirr girîng e. Di siyasetê de, di warê çandê de, orf û aded, muzîk û sitran, di folklorê de parastina nasnamê xwedî cihekî girîng e. Ev nayê wê wateyê ku meriv dibe nîjadparêz, yan jî dijberê her tiştê ne ji xwe. Berovajî, dostanî û nêzîkbûn bi îhtîrama hemû cudabûnan hê xurttir û kûrtir dibe.
Di sala 1977 de ez hatim Beljîka.
Li bajarê Leuven, bi cî bûm. Li ser pêşniyara rehmetiyê Hemreş Reşo, mamosteyê hêja, min berê xwe dabû welatekî ku qet nas nedikir. Di wê demê de KSSE (Yekîtiya Xwendekarên Kurd li Ewropa) hebû û bi hatina xwe re min tev deh xwendekarên Başurî xebata Kurdî meşand. Ji bo nasandina pirsgirêkên Kurdistanî û zor û zilma li ser gelê me, pêdiviya xebateke berfereh hebû. Ji bo wê jî peywendî bi rêxistin, kesayetî, partî û dezgehên cuda hebû. Tev hevalekî ji nava komelê me dest bi wî awayê xebatê kir. Bi saziyên demokrat yên civakên cuda re jî peywendi hêdî hêdî ava bûn. Lê bîreweriya herêmî û bi awayekî kerr û kor hizbayetî li aliyekî, zikreşî û dilnexwaziya şexsî li aliyê din ya endamên me ev xebat seqet dikir.
Dema min dît xebat her diçe dikeve çarçeweya hizb û herêmî de min biryar da li Kurdên din bigerim ku xebateke Kurdistanî bi rê ve bibin. Bi gelek zehmetiyan şeş kes peyda bûn. Her şeş jî xwedî sempatiyên cuda ji partiyên cuda re hebû. Me biryar stend ku em tûrikê partî û îdolojiya li devê derî deynin û xebateke neteweyî li dar bixin. Bi navê Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljîka "Têkoşer" ava bû. Lê dîsa her kes xwedî sempatiya partiya xwe bû. Zimanê Kurdî di xebata me de serekî bû. Xebata Folklor û muzîkê hat meşandin. Peywendî bi awayekî pirr xurt bi dezgeh û keseyetiyên civakên din re bi awayekî xurt hatin avakirin. Bê goman bi saziyên "demokratîk" ji civaka Turkiyê re jî peywendî xurt bûn. Lê balkêş bû ku saziya me Kurdan li ba 99 % ji wan re her tim bi pirsgirêk bû. Wan di her fersendê de û li her cî daxwaza "bihevrabûnê dikir". Ango, "çima komeleyeke Kurdî?" "Ev nabe cudaxwazî?" "Ev nabe xizmetkariya daxwazên emperyalîzmê ku welatê me parçe dike sedema mayina me ya bindest e." Balkêş e, di bajarê Bruksel de 12-13 komelên cuda ji yên Turkiyê hebûn, cudabûn û xeter tê de nedihat dîtin, lê dema yek bi nave Kurdî hebû dibû cudaxwazî! Û dive were gotin ku pirraniya van serkêşên van komelen jî bi eslê xwe "Kurd" bûn. Digotin "em Turkiyelî ne!" Me jî digot "em jî Kurdistanî ne!" û rûyê wan tirş dibû. Lê xema me nebû. Me bi biryar xebata xwe domand.
Xebata Kurdistanî, di destpêkê de bio navê Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljîka "Têkoşer" û paşê jî bi nave Enstituya Kurdî ya Brukselê domand û hêjî berdewam e. Saziya me ji aliyê wezaretên Kultûrê, dezgehên akademîk, partiyên siyasî û dezgehên vî welatî fermi hatiye pejirandin û bi serbilindî xebata xwe ya Kurdistanî didomînin.

# Divê êlên Efrînê li dijî dagirkeriyê bibin yek

**Komîteya Têkiliyên Dîplomasî ya Herêma Şehbayê xebatên xwe yên bi rêxistinkirinê berdewam dike. Komîte bi armanca ku eşîrên Kurd û Ereb bên bi rêxistinkirin komîteyan ava dike. Koordînatorê Komîteya Têkiliyên Dîplomasî ya Şehbayê Mihemed Xidro got, “Divê êlên Efrînê li dijî dagirkeriyê yekîtiya xwe ava bikin.”**

Komîteya Têkiliyên Dîplomasî ya Herêma Şehbayê bi mebesta êlên Kurd û Ereb bêne birêxistinkirin, komîteyan ava dike.
Piştî lidarxistina civîn û girtina nêrînên êlên Ereb û Kurd ên li Şehbayê, Komîteya Têkiliyên Diplomasî bi armanca birêxistinkirina wan û şikandina siyaseta ku tevliheviyê belav dike, komîteyên êlan ava dike.
Heta niha komîteyê, komîteyek li navçeya Til Rifatê ava kir û ew wê li Kefer Naya, Kefer Nasih û Ehrezê komîteyan ava bike.
Her komîteyek ji 7 heta 10 endaman, di nav de berdevkên komîteyê pêk tên. Her wiha komîte ji bo danîna plansaziyên xwe wê her 15 rojan carekê bicivin.
Koordînatorê Komîteya Têkiliyên Dîplomasî ya Şehbayê Mihemed Xidro li ser armanca avakirina van komîteyan axivî.
Xidro diyar kir ku wan civîn li dar xistin, komîte ava kirin û wê xebatên xwe ji bo birêxistinkirina hemû êlên Şehbayê bidomînin û got: “Armanca me ewe ku êlên herêmê hîn bêtir bi rolên xwe rabin.”
Mihemed Xidro got, “divê êlên ku li Efrînê dimînin ji bo derxistina dagirkeriya tirk ji Efrînê refên xwe bikin ye.”…*ANHA*



## Sûka El-Qiwetlî nîşaneya pêşketina bajare



Şêniyên bajarê Reqayê pêdiviyên xwe ji sûkên gelêrî dikirin. Sûka El-Qiwetlî ya kavn yek ji sûkên kevnar e ku bi destpêka avakirina bajarê Reqayê re ava bû û şahidiya dîroka Reqa ya nûjen dike.
Sûka Kevn a bajarê Reqayê ku bi navê kolana El-Qiwetlî tê naskirin, ji girîngtirîn û kevntirîn sûkên bajêr e. Koçer û şêniyên Reqayê mişteriyên daîmî yên sûkê bûn.
Rîs, nivîşk, mast, penêr û berhemên çandiniyê bi hev diguhartin. Di sûkê de hemû pêwîstiyên şêniyên gundewarên bajêr û koçeran peyda dibin.
Avakirina sûkê bi dîroka bajarê Reqayê ve girêdayî ye. Dîroka sûkê nagihîje dîroka Dîwara ku di dema El-Reşîd de ava bûye yan jî dîroka avakirina deriyê Bexdayê, lê li gorî kal û pîrên bajêr temenê sûkê 200 sal e.
Xwediyên dikanên yekemîn li Sûka Kevn anî ziman ku dema bavên wan hatine bajêr, sûk mîna girekê bûye. Li aliyê sûkê yê rojava bazara pez û li aliyê başûr jî çerxêriya El-Saet heye ku niha wek Qada Agirkujê tê naskirin.
Xwediyên dikanên kevn li sûkê niha heman tiştan difiroşin. Mînak; xwediyên dikana pûrtên ajalan û cilên ku ji çermê ajalan çêdibin, heta niha vî karî dikin û ev cure cil bi awayekî pir di nav şêniyên gundewar û koçberên ereb de belav bûye û bi taybet di werza zivistanê de.
Li ser dîroka sûkê xwediyê dikanekî li Sûka Kevn Ebdulrehman El-Sultan yê 70’ê salî wiha got: “Dema malbata min hat Reqayê ez biçûk bûm. Pira ku niha heye di wê demê de tune bû. Em bi rêya keştiyê ji herêma El-Sixnê derbasî Reqayê bûn û me yekemîn dikana penêr û mast li sûkê vekir.”
Di destpêka avabûna sûkê de, koçberên ereb û xwediyên dikanên bazirganiyê (El-Suxanî) made bi hev diguhertin. Koçberên ereb û şêniyên gundewaran nivîşk, mast, penêr û rîs dianîn dikanan û bi madeyên din wekî şekir, zeyt, sabûn, birinc û her wekî din diguhertin.
Dikanên mast, penêr û firotina pêdiviyên konên ku ji hiriya sewalan dihatin çêkirin ji werîs (ben), hesin û derzî, yekemîn dikanên sûkê hatin vekirin. Bazirganên ku ji herêma El-Suxne (herêmeke girêdayî gundewarên rojhilatê Humsê ye) ku bi navê El-Suxanî li herêmê dihatin binavkirin, ji avakerên sûkê ne.
Sûka Kevn li Reqayê heviya çîna xizan a ji şêniyên gundewar û bajar e. Sûka Kevn, sûka herî bi nav û deng li gel şêniyên Reqayê ye. Ji çerxeriya El-Saet rojava dest pê dike û heta Dîwarê El-Reşîd li aliyê rojhilat e. Sûk navenda çalakiyên aborî û bazirganiyê ye. Sûk nêzî navenda bajêr e. Sûka El-Qiwetlî gelek berfireh bû û di nav kolanên bajêr ên ku niha bûna sûkên sereke şax da. Heta niha kolana kevn cihekî wê yê taybet li gel şêniyên Reqayê heye û dikanên wê yên herî bi nav û deng in.
Piştî gelek pêşketinên ku li bajêr rûdane, niha şêniyên gundewarên wê û koçberên ereb pêdiviyên xwe bi pereyan ji sûka kevn dikirin. Sûk heta niha mîrat û muşteriyên xwe parastiye…*ANHA*

## Li Tebqayê xebatên xizmetê dewam dike



Bi armanca peydakirina ava vexwarinê ji gundên Cehber ê rojhilat û Siwêdiyê projeya kişandina boriyên nû hate destpêkirin.
Tîmên sererastkirinê yên ava vexwarinê li herêma Tebqayê bi hevkariya rêxistina ‘Bi hev re ji bo El-Curniyê’ beriya demekê projeya kişandina boriyên ava vexwarinê da destpêkirin.
Xebatên kişandina boriyan ji bo peydakirina ava vexwarinê ji 3 hezar welatiyên gundên Cehber ê rojhilat û Siwêdiyê yê biçûk re bê navber berdewam dikin. Girêdayî mijarê endezyarê çavdêriya projeyê Esaf Taha wiha got: “Boriyên kevn wê bi boriyên nû bêne guhertin.”
Taha destnîşan kir ku projeya wan di nîvê meha Tebaxê dê wê bi dawî bibe.
Şaredariya Gel a Tebqayê niha bi rêya tankeran ava vexwarinê li van gundên navborî belav dike… *ANHA*

## Avê hê jî bi dewlikan ji bîrê derdixin



Şêwazên derxisitina avê yên kevn heta niha li gundên başûrê navçeya Til Hemîs li Bakurê Sûriyê tên bikaranîn. Av bi rêya dewlikan ji bîran tê derxistin.
Di demên borî de mirov dewlik (satil) ji bo derxistina avê ji bîran bi kar dianîn. Lê, ev şêwaz hat jibîrkirin.
Piştî ku çeteyên DAIŞ, Nusra û Ehrar El-Şam herêm dagirkirin, binesaziya herêmê hat talankirin û amûr û alavên pêwîst dizîn û her wiha piştî qutbûna ceyranê şêwaza derxistina avê ji bîran bi dewlikan ji nû ve li gundê Xirbit Umer û mezraya Xirbit Umer vejiya.
Bi dehan gundên başûrê navçeya Til Hemîs ji ber kêmbûna avê zehmetî dikişandin. Ji ber wê şêniyên gundê Xirbit Umer û mezraya Xirbit Umer bîrên bi kûrahiya 2-4 metre kolandin û av bi rêya dewlikan derxistin. Şêniyên gund ji bo derxistina avê ji bîrên ku bi hev re kolandine, dibin alîkar…*ANHA*

## Li Kobanê dema berhevkirina fistiqan e

Şêniyên gundên rojavayê Kobanê di nava metirsiyên ji ber ambargoyê de dest bi berhevkirina berhemên fistiqan kir.
Herêmên li ser çemê Firatê di aliyê çandina darên fêkiyan de dikevin rêza 3`yemîn li ser asta Bakurê Sûriyê. Ev yek ji ber rewşa wê ya hewayê û zeviyên avî ye.
Li kantona Kobanê çandina daran li gundên rojava tê kirin, di serî de jî darên fistiqên Helebî. Ji ber ku axa wê ji bo çandina wan daran kêrhatî ye.
Li gorî cotkaran rêjeya çandina darên fistiqan ên bi navê “fistiqên helebî” tên naskirin, li gundewarên rojava zêdetirî 35 hezar daran e.
Berhemên darên fistiqan li gorî lênerîna cotkaran e. Ji ber ku her çi qas cotkar darên xwe av bidin û lê binêrin, ew qasî dê berhemên wan baş bin.
Li kantona Kobanê ji ber kêmbûna barîna baranê bandoreke neyînî li berhemên fistiqan hat kirin. Cotkaran got ku ji ber vê yekê berhemên wan ne baş bûn.
Beriya çend rojan cotkaran dest bi berhevkirina berhemên fistiqan kirin.
Cotkarê bi navê Mihemed Seydo got îsal berhemên wan ne wekî salên din in. Seydo diyar kir ku ew ji ber ku dibe nikaribin berhemên xwe derxin derve, di nava metirsiyan de ne…*ANHA*





# Pêngava Azadiya Ocalan tê destpêkirin

***Kongreya Star amedekariyên destpêkirina pêngava 3’emîn ya Azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dide destpêkirin. Endama Rêveberiya Kongreya Star Zehra Berkel diyar kir ku ew ê di 2’yê Tebaxê de bi awayekî fermî dest bi çalakiyan bikin. Zehrayê got, “Emê têkoşîna xwe ya ji bo azadiya rêber Apo berdewam bikin.”***



Endama Rêveberiya Kongreya Star Zehra Berkel ragihand ku ew ê di 2’yê Tebaxê de pêngava 3’emîn ya Azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bidin despêkirin.
Rêxistina Kongireya Star amedekariyên destpêkirina pêngava 3’emîn ya Azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û belav kirina Felsefeya wî dide destpêkirin.
Endama Lijneya Rêveberiyê ya Kongreya Star Zehra Berkel diyar kir ku ew ê di 2’ê Tebaxê de bi awayekî fermî dest bi çalakiyên xwe bikin.

### ARMANC BELAVKIRINA ÎDEOLOJIYA AZADIYÊ YE

Zehra Berkel di despêka axaftina xwe de bal kişand ser armanca hemleyê û wiha got: “Piştî ku me konfransa xwe ya 3’emîn Li dar xist, yek ji biryarên me yên girîng ew bû ku em ji bo Azadkirina Rêber Apo hemleyan bidin des pêkirin. Bi vê yekê jî me weke rêxstina Kongireya Star amedekariyên lidarxistina pêngava 3’emîn ya bi daxwaziya azadkirina rêber Apo da destpêkirin. Armaca me ew e ku em bi hêza jinê îdeolojiya Rêber Apo belav bikin û jinan bi wê yekê jî bi rêxstin bikin.”

### 2’YÊ TEBAXÊ PÊNGAV DEST PÊ DIKE

Zehreyê di dewama axaftina xwe de çarçoveya çalakiyan diyar kir û wiha axivî: “Wê di 2’yê Tebaxê de pêngav me bi daxuyaniyeke fermî dest pê bike. Her wiha di heman rojê de wê meşeke girseyî li Kantona Kobanê were lidarxistin. Her wiha wê semîner jî werin dayîn û civîn jî di hemû taxan de werin li darxstin. Wê sinfezyonên li ser jiyana Rêber Apo werin pêşkêşkirin. Di heman demê de wê daxuyanî jî di vê çarçoveyê de jî aliyê hemû saziyan ve werin dayîn.”

### ARMANCA ME AZADIYA RÊBERTIYÊ YE

Endama Lijneya Rêveberiyê ya Kongireya Star Zehera Berkel wiha dawî li axaftina xwe anî: “Ev pêngava sêyemîn e. Di pêngavên berê de jî çalakiyên cur bi cur hatin lidarxistin. Lê di hîn aliyên danasîna felsefeya Rêbe Apo de lewazî hatin jiyîn. Ji bo vê jî biryara me ew e ku em zêdetir Fikir û Felsefeya Rêber Apo di nava jinan de belav bikin. Ji bo vê jî hêviya me ew e ku em bi riya vê pêngavê pirojeya Rêber Apo ya azadiya jinê bidomînin da ku em rizgariya rêber Apo û azadiya tevahî jinan bi dest bixin.”…*JINNEWS*

## Ji bo Rêber Apo emê têkoşînê dewam bikin







Dayikên berxwedêr ên Efrînê ku niha li Şehbayê dimînin derbarê tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de gotin:”Dewleta tirk a dagirker Rêberê me di zindana Îmraliyê de digire û tecrîdek giran li ser dimeşîne. Lê dilê me bi dilê Rêberê me lê dide. Em ê her dem ji bo azadiya Rêberê xwe têbikoşin.”
Dayikên berxwedêran ên Efrînê ku niha li Kantona Şehbayê dimînin bertek nîşanî tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin dan û gotin: “Rêber Apo sembola azadiyê ye. Em ê jî her dem şopdarên nêrîn û ramanên sembola azadiyê bin.”

### RÊBER APO JIN RIZGAR KIR

Dayika Remziye Hesen anî ziman ku ew ê heta dilopa xwîna xwe ya dawiyê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têbikoşe û wiha got: “Em wekî dayikên şehîdan tu carî zilma ku li Rêberê me tê kirin qebûl nakin. Rêber Apo rêya jinê û civakê bi hev re ronî kir. Civak ji xewnek kûr şiyar kir. Ji ber ku Rêber Apo kesekî demokrat û rewşenbîr e loma kompleyek navneteweyî li ser serê wî pêk hat. Lê em tu carî vê neheqiyê qebûl nakin. Bila dewleta tirk a dagirker baş bizanibe ku em tu carî ji fikrin Rêberê xwe qut nabin. Rêber Apo jin ji zincîra koletiyê rizgar kir. Em ê jî di rêya fikirên Rêberê xwe de têkoşîna xwe bidomînin.”

### ME TÊKOŞÎNA XWE MEZIN KIR

Dayika bi navê Zeyneb Hesen jî diyar kir ku ew tu carî çonga xwe natewînin û got: “Rast e dibe ku Rêber Apo di zindanê de be lê ew her dem di dilê me de ye. Fikrên wî yên azad di mejiyê her jinêkê de dijî. Bi saya rê û rêbazên Rêber Apo me têkoşîna xwe mezin kir. Dê Rêber Apo bi saya têkoşîna dayikên şehîdan azad bibe.”

### EM’Ê TÊKOŞÎNÊ DEWAM BIKIN

Dayika bi navê Nezîro Elo anî ziman ku ew feyza têkoşînê ji Abdullah Ocalan digire û got: “Mafê tu kesî tuneye ku Rêberê mirovatiyê di zindanê de bihêle. Ji ber ku Rêberê me jiyanek azad diparêze îro di zindanê de yê. Lê yên ku diziyê dikin û mirovan qetil dikin jî li derve ne. Rêber Apo Rêberê tevahî gelan e. Çimkî ew mafê hemû gelan diparêze. Heta dawiya emrê xwe em ê ji bo azadiya Rêberê xwe têbikoşin.”…*JINNEWS/Şehba*

## Raporeke sosret dan Sisê Bîngol



Nexweşxaneya Dewletê ya navçeya Tarsûsê a girêdayî bajarê Mêrsînê ya Tirkiyê, ji bo girtiya nexweş raporeke sosret da. Ji bo Sîsê Bîngol a 76 salî ku nexweşiyên wê yên gurcik, tansiyona bilind, û nexweşiyên diyabetê hene, got, “Mayîna wê ya di girtîgehê de metirsiya jiyanî çênake.”
Her ku diçe rewşa tendirûstiya Sîsê Bîngol a 76 salî ku li Girtîgeha Tîpa T a Tarsûsê tê ragirtin, giran dibe. Teşhîsa nexweşiyên weke dil, gurcik, riya destavê, tansiyona bilind, şekir û hwd, hatibû danîn.
Nexweşxaneya Dewletê ya Mûşê ji bo Bîngolê biryara “Nikare bi serê xwe di zindanê de jiyana xwe bidomîne” dabû lê; Saziya Tip a Edlî rapora ku “Bi serê xwe dikare di zindanê de bimîne” da.
Bîngol ji vir sewqê nexweşxaneya dewletê ya Tarsûsê hat kirin û Desteya Tendirûstiyê ya Nexweşxaneya Dewletê, ligel ku teşhîsa nexweşiyên gurcik, şekir û tansiyona bilind danî jî, rapora ku Sîsê Bîngol dikare di girtîgehê de bimîne, da.

### EV HIŞMENDIYA DIJMINATIYÊ YE

Parêzera Sîsê Bîngol Gulşen Ozbek jî , bertek nîşanî biryarê da û got, “Ligel ku pirsgirêkên mezin ên tendirûstiyê yên Sîsê Bîngol hene jî desteya tendirûstiyê ku ew muayene kirî rapora ‘Tu astengî li pêşiya mayîna wê ya di girtîgehê de nîn e’ da. Ligel ku ewqas nexweşî hatine teşhîskirin jî ev biryar da. Tu têkiliya vê raporê bi etîka tipê re nîn e. Ji pîvanên zanistiyê dûr, raporeke ku bi giştî bi hestên dijminatiyê hatî amadekriin e. Em ê serî li cihên pêwîst bidin ku ev rapora derqanûnî bê betalkirin.”

## Jin wê têkoşînê bilind bikin



Çalakvana TJA Mekiye Ormanci, pergala Hikûmeta Serokkomariyê, qanûna Rewşa Awarte ya li Meclîsê hat qebûlkirin û peywirên ji bo walîtiyan hatin dayîn nirxand û got: “Wê li herêmê Rewşa Awarte bidin jiyîn.”
Piştî Rewşa Awarte (OHAL) hat rakirin, pêşniyara qanûna sererastkirinê ya piştî OHAL’ê di Desteya Giştî ya Meclîsê de hat qebûlkirin. Li gorî vê yekê peywirên berfireh ji bo walîtiyan hat dayîn. Aktîvîsta Tevgera Jinên Azad (TJA) Mekiye Ormanci, pergala Hikûmeta Serokkomariyê, qanûna OHAL’ê ya di Meclîsê hat qebûlkirin û peywirên ji bo walîtiyan hatin dayîn nirxand.
Ormancı, diyar kir ku kirînên pergala nû ya yekemîn daîmî kirina OHAL’ê bû û wiha axivî: “Armanca dikin ku hebûn hikûmetê li ser walîtiyan berdewam bikin. Weke ku tê zanîn li Rojhilata Navîn dengeyên heyîn bi lez tên guhertin û pêdivî heye ku Tirkiye jî demildest biguhere. Niha li Tirkiyeyê guhertin bi aliyek pir cûda ve çû. Tirkiye pêvajoyek bi êş dijî. Em nikarin behsa pergalek erênî ya li gorî raza civakê bikin. Ji xwe kirînên wan li holê ye. Modela Tirkiyê ya ku bi kesan hatî teşegirtin, li pêşberî me ye.”
Ormanci, da zanîn ku naveroka vê pergalê valeye û wiha got: “Li herêmê rewşa awarte tê jiyîn û li gorî keyfa desthilatdariyê tê guhertin. Em nikarin behsa pergaleke ku li gorî qanûn û hiqûqê tedgere bikin. Pirsgirêkên 40 salin li vê herêmê tên jiyîn li holêne. Di serdema nû de, dê pêkanînên ji OHAL’ê xerabtir bên jiyîn. Dê bi tu awayî mafê jin, ciwan û civakê berçavan re derbas nekin.”
Ormanci, bal kişand ser peywirên di serdema nû de ji bo walîtiyan hatin dayîn û wiha bilêv kir: “Dê bi pêkanînên cuda êrîşî têkoşîna jinan bikin. Ji bo hemû qezencên jinan ji destên wan bigirin, dê zextan berdewam bikin. Ev nêzîkatiyên faşîzmê ne. Aliyên wê yên bên qebûlkirin tuneye.”
Ormanci, dest nîşan kir ku weke jinên Kurd dê bi her awayî têkoşîna xwe berdewam bikin û wiha rêz kir: “Qadên azad wisan bi erzanî men bi dest nexistin. Me bedelên pir giran dan. Emê wisan erzan jî dev ji qadên me qezenc kirin bernedin. Dibe ku zor be, lê em dikarin bi wan gav paşve bidin avêtin. Emê kolan û koçeyan terk nekin û heya dawiya emê li ber xwe bidin.”
Ormanci, di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Pergala Hikûmeta Serokkomariyê ji aliyê civakê ve nayê qebûl kirin. Ji bo em vê pergalê berteref bikin, emê di serdema nû de bi pêşengtiya jinan xeta têkoşînê bihûnin.”…*MA*

# Destûra Bingehîn bê me nabe

***Berpirsyarê Komîteya Têkiliyên Derve ya TEV-DEM'ê Salih Muslim li ser hevdîtina heyeta MSD'ê ya bi rêjîma Sûriyê re diyar kir ku mesele bi hevdîtinekê çareser nabe û wiha got, "Ji bo her du aliyan tê wateya hewldana ji bo fêhmkirina niyeta baş û afirandina baweriya bi***

Salih Muslim li ser hevdîtina heyeta MSD'ê ya bi hikumeta Sûriyê re axivî û diyar kir ku wê veger li sîstema berê ya dîkatorî nebe. Muslim got, "Em dixwazin sîstema xwe ya demokratîk li gelemperiya Sûriyê belav bikin."
Heyetek ji Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê roja 26'ê Tîrmehê çû Şamê û yekem car bi rayedarên hikumeta Sûriyê re hevdîtineke fermî pêk anî. Berpirsyarê Komîteya Têkiliyên Derve ya TEV-DEM'ê Salih Muslim hevdîtina heyeta MSD'ê ya bi rêjîma Sûriyê re nirxand.
Muslim diyar kir ku hevdîtin bi daxwaz û vexwendina fermî pêk hat û got, "Heyetek ji Bakurê Sûriyê çû. Ji bo komîteyeke amadekar ya jî fêhmkirina nêzîkatiya rejîmê, ku cidî ye yan na, heyet çû Şamê. Lê em naveroka hevdîtinê baş nizanin."



Muslim diyar kir ku mesele bi hevdîtinekê çareser nabe û wiha got: "Hevdîtin cûda ye, diyalog cûda ye, danûstandin cûda ye. Prosedur, rê û rêbazên her kesî cûda ye. Her kes xwedî rêbazekê ye. Ya ku niha tê kirin pêşhevdîtin e. Yanî ji bo her du aliyan tê wateya hewldana ji bo fêhmkirina niyeta baş û afirandina baweriya bi hev. Eger di vê mijarê de rewşeke erênî derkeve holê wê gavên din jî din jî dikarin bên avêtin."

### DESTÛRA BINGEHÎN BÊYÎ ME NABE

Li ser nîqaşên derbarê destûra bingehîn a Sûriyê de jî Muslim got, "Destûreke Bingehîn a ku Nûnerên me di amadekirina wê de nîne, qebûl nabe. Li Soçiyê tiştekî wiha heye. Ji her du aliyan 50 kes hene. Ji delegasyonên mûxalefetê û rejîmê wê 50 kes biçin. Di nava 'mûxalefetê de jî wê 2 Kurd hebin. Biryara di vê mijarê de di destê Stenbolê, ya jî Tirkiyê de ye. Lê belê zanin ku eger em nebin, nabe."
Em jî bi awayekî vekirî dibêjin; eger em bi nasnameya xwe, bi îradeya xwe tevlî destûra bingehîn an jî qanûnekê nebin, ew destûra bingehîn û qanûn ji bo me derbas nabe, ya jî nepêkan e ku bi cih were anîn. Ti biryara ku em bi nasnameya xwe tevlî nebin, me eleqedar nake. Ji bo ev hevdîtin rê li ber çareseriyê veke, pêwîste di mijara destûra bingehîn de hevdîtineke hevpar bê kirin. Eger em di pêvajoya danûstandinan de bi pêş ve biçin, teqez wê komîsyoneke destûra bingehîn jî hebe. Wê gelek komîsyon hebin. Qanûn, polîtîka, her mijar wê yek bi yek bên nîqaşkirin."…*ANF*

## Dîplomasiya di navbera Şam û Qamişlo



Ezîz KOYLUOGLU

Dîplomasiya di navbera Şam û Qamişlo'de cara yekem bi fermî destpêkir. Berî niha jî gelek hevdîtin di navbera Şam û Qamişlo de dihat kirin, lê ev hevdîtin nedigîhiştin asta ku bê ragihandin. Ragihandina vê hevdîtinê diyar dike ku, êdî têkiliyên rêjîma Sûrî û rayedarên Bakûrê Sûriyê gihiuştiye astekî hevdû fêhmkirinê. Balkêşe ev hevdîtin piştî têkiliyên Rûsya û Emerîka li ser Sûriyê gihiştin asteyek ku, li ser Sûriyê di xalên giştî de lihevkirinê. Di ragihandinê de jî eşkere bû ku, Rûs û Emerîka êdî li ser Sûriyê di gelek xalan de nêzîkî hevbûne. Vê nêzîkatiyê bi taybet lez da rewşa li Sûriyê. Mirov nikare vê hevdîtina di navbera Şam û Qamişlo'de ji vê rewşê qut bigre dest. Lewma ne bi erêkirina Rûsan be, Şam nikare têkeve nava hevdîtinên bi vî rengî. Berî niha jî Şamê dixwest bi Kurdan re li ser esasê xweseriyê lihevbike, lê Îran li pêşiya vê asteng bû. Diyare ku Rûsan ev astengiya Îranê ji holê rakiriye.
Aliyê herî girîng di vê hevdîtinê de Meclîsa Sûriya Demokratîk hat muxatap girtin û Şamê ji bo hevdîtinan fermî ew vexwendin. Ev jî nîşan dide ku di rewşa heyî de guhertinên mezin hene. Berî niha jî li ser hin cihên xizmeta gelên li Sûriyê dike hin lihevkirin hebûn. Bi taybet li ser bendava Tebqa ku ceyrana herêmeke fireh pêşwazî dike, lihevkirin pêk hatibû. Ev wek gavek erênî hatibû pênasekirin.
Berî niha jî civînên Cenev û Astana ku ji bo çareseriya şerê li Sûriyê hatibûn lidarxistin tu encamek berbiçav nedan. Ev demeke Cenev bi temamî ji rojevê derketiye. Û ne rejîma Sûriyê ne jî beşdarvanên din yên vê civînê girîngî didinê. Civînên Astana jî ku wek çareseriyek hatibû destnîşankirin, lê berovajî ji bo jinavbirina komên çekdar rolek lîst. Rola Dewleta Tirk jinavbirina komên çekdar de sereke bû. Ji 4 herêmên ku agirbest lê hatibûn ragihandin, 3 ji wan bi temamî ket bin serweriya rejîma Sûriyê. Ji wan herêma Îdlib wek heremek nakok li meydanê ye. 10. Civîna Astana ku tê payîn di demek nêzde bê lidarxistin ji niha ve bê wateye. Ev hevdîtinên çareseriyê ku di navabera Şam û Qamîşlo de destpêkirine, wê ji bo herêmên din jî çareseriyê bi xwere bîne.
Piştî hevdîtinên li Şam'ê rayedarên Meclîsa Sûriya Demokratîk ji bo raya giştî daxuyaniyek dan. Li gorî daxuyaniyê tê gotin ku ji bo muzakere bên destpêkirin wê di herwarî de komîteyan avabikin. Bi avakirina van komîteyan di warê destûrabingehîn, rewşa xizmetguzarî, îdarî û leşkeri wê li ser Sûriya pêşerojê danûstandin bên kirin.
Rayedarên Bakûrê Sûriyê ji destpêkê de ji bo ku bê şer û bi diyalogê aloziya li Sûriyê çareser bibe bang dikin. Lê him dewletên herêmê him jî rejîma Sûriyê ji bo wan banga amade nebû. Bi taybet hêzên navdewletî yên li Sûriyê siyaset dikirin, nedixwestin aloziya Sûriyê çareser bibe. Lewre jî çareserî di berjewendiyên xwe de nedidîtin. Lê xuya dibe ku êdî beşek ji wan hêzan jî çareseriyê di berjewendiyên xwe de dibînin. Ev guhertinek mezine li Sûriyê.
Li ser bingeha çareseriyê danûstandin tê wateya ku ji her du aliyan jî tawîz dayînê. Ji niha ve hêzên çareseriyê naxwazin û dijber ketine nava hewldanên reşkirinê. Bi taybet nijadperestên herdu aliyan û dewletên wek Tirk û Qeter, heta radeyekî Îran wê bixwazin lihevkirineke demokratîk di navbera Şam û Qamîşlo de pêk neyê. Divê him rejîma Sûriyê him jî radarên Bakûrê Sûriyê li hemberî hemû astengiyan bi sebrek mezin bisekinin.

## Divê sûdê ji ezmûnên Rojava bigirin

Endamê Hizba Komunîsta Îranê (Komele) Enwer Elî eşkere kir ku ji bo rewşa Îranê ew ne li gel destwerdana dervene û diyar kir ku ji bo rewşa Îranê divê sûd ji ezmûnên Rojavayê Kurdistanê werin girtin.
Endamê Rêxistina Kurdistan a Hizba Komunîsta Îranê (Komele) Enwer Elî derbarê nakokiyên navxweyî yên Îranê, rêyên çareseriyê û nexşerêya PJAK û KODAR'ê ji bo çareseriyê eşkere kirî axivî.
Enwer Elî eşkere kir ku ji bo rewşa Îranê ew ne li gel destwerdana dervene û diyar kir ku ji bo rewşa Îranê divê sûd ji ezmûnên Rojavayê Kurdistanê werin girtin û got; "Li Iraqê û Afganistanê destwerdana derve hate ceribandin û encamên wê jî hatin dîtin. Lewma ji bo rewşa Îranê, em ne li gel destwerdana



dewletekî dîktator û sermayedar in û em red dikin. Baweriya me bi raperînê heye ku ji aliyê gelê Îranê ve be."
Enwer Elî diyar kir ku baweriya wan bi têkoşîna çîna karker û kedkar heye û got ku bi çîna karker dikarin îradeyekî azad çê bikin.

### DIVÊ GELÊN ÎRANÊ XWE BIRÊXISTIN BIKIN

Elî bal kişand ser girîngiya ezmûnên Rojavayê Kurdistanê ku gel bi xwe xwe rêve dibe û wiha pêde çû; "Ezmûnên Rojavayê Kurdistanê baş e û dikarin sûd jê bigirin. Divê gelên Îranê xwe bi rêxistin bikin û weke Rojava xwedî bername bin. Ev ezmûnekî serketiye û destkeftiyekî mezin e li Rojhilata Navîn e. Ji bo pêşeroja Îranê jî gelek sûdên wê hene."
Enwer Elî der barê nexşerêya PJAK û KODAR'ê ya ji bo çareserkirina pirsgirêkên Îranê jî wiha got; "Komera Îslamî ya Îranê qet baweriya wê bi aştiyê nîne. Mafê gelên Îranê nas nake û wê nexşerê qebûl neke.
Endamê Rêxistina Kurdistan a Hizba Komunîsta Îranê (Komele) Enwer Elî têkildarî parastina rewa ya di nava nexşerêya PJAK û KODAR'ê de wiha destnîşan kir; "Divê timî baweriya Kurdan a ji bo parastina mafê xwe hebe. Lê divê di serî de civakê rêxistin bikin û bi bername kar bikin."…
*ROJNEWS*

## Dagirkeriya Tirkiyê planekî navnetewî ye

Çavdêrê Siyasî Faleh Selah eşkere kir ku ji aliyê Tirkiyê ve dagirkirina xaka Başûrê Kurdistanê planekî navneteweyî ya li dijî daxwazên gelê Kurd e û diyar kir ku sedema bêdengiya Iraqê, ji ber ne serbixwebûna hikûmeta wê ye. Hikûmeta Başûrê Kurdistanê û Iraqê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk a ser xaka Başûrê Kurdistanê bêdengî hilbijartiye û ji ber bêdengiyê her ku diçe dagirkeriya dewleta Tirk berfireh dibe. Ev bêdengî heta niha gelek caran ji aliyên beşê cuda yên civakê ve hatiye rexne kirin. Çavdêrê Siyasî Faleh Selah li ser mijarê diyar kir ku ev dagirkerî ne tenê ji aliyê welatekê ve tê kirin û got ku li dijî gelê Kurd planekî navneteweyî ye.
Selah da zanîn ku berpirsyartiya parastina sînorên Herêma Kurdistanê Iraqê de û got; "Iraq welatekî federale û erka parastina sînorên Herêma Kurdistanê li ser stûyê hikûmeta Herêma Kurdistanê ye bi alîkariya hikûmeta navendî."



Selah bal kişand ser bêdnegiya hikûmeta Iraqê ya li hemberî bombebaranan û wiha pêde çû; "Iraqê bernameyek zelal ji bo siyaseta navneteweyî û hundirîn nîne. Di nava xwe de parçe bûye. Hêzên siyasî li ser çend cemseran de hatine parve bûne. Armancên Tirkiye, Îran, Amerîka û Rûsya pêk tînin. Lewma di vê valahiya siyasî de nikare bibe xwedî nexşe û planekî nîştimanî ji bo parastina serweriya xaka xwe."
Çavdêrê Siyasî Faleh Selah eşkere kir ku ji bo tejîkirina valahiya siyasî ya heye, divê demildest hikûmeta nû ya Iraqê bê avakirin û got; "Avanekirina hikûmetê dîsa peywendî bi destûr dana welatên herêmî û navneteweyî ve heye."…
*ANHA*

## MŞD'ê ji bo 3'ê Tebaxê bang kir

Meclîsa Şengalê ya li Derveyî Welat (MŞD) ji bo çalakiyên 3'ê Tebaxa 2018'an ku bi pêşengiya Sîwana Meclîsên Jinên Êzidî wê li 8 herêmên Elmanyayê bên lidarxistin banga tevlîbûnê kir.
Meclîsa Şengalê ya li Derveyî Welat bi wesîleya salvegera 4'an a Qirkirina Şengalê daxuyaniyeke nivîskî weşand û bang li welatparêzan bi taybetî civaka Êzidî kir ku tevlî çalakiyên protestoyî bibin ku wê bi pêşengiya Sîwana Meclîsên Jinên Êzidî werin lidarxistin.
MŞD'ê diyar kir ku dewleta Tirk ji bo Şoreşa Rojava bifetisîne û hemû destketiyên Kurdan ji holê rake, bi destê DAÎŞ'ê êrîşî civaka Kurd kiriye û êrîşa 3'ê Tebaxa 2018'an jî yek ji van e.
MŞD'ê da xuyakirin ku tiştên DAÎŞ'ê nekarî temam bike, niha faşîzma AKP'ê bi xwe dixwaze temam bike û destnîşan kir ku dagirkirina Efrînê, êrîşên li ser Başûrê Kurdistanê û bêdengiya PDK'ê beşekji plana rejîma Tirk e.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku PDK taşeronê AKP'ê ye û xizmetê ji gelê Kurd re nake.
MŞD'ê êrîşên li ser Efrînê, Bradostê, Bakurê Kurdistanê û yên li ser Şengalê bi bîr xist û bang li gelê Kurd, bi taybetî civaka Êzidî kir ku roja 3'ê Tebaxê beşdarî çalakiyên protestoyî bibin.
MŞD'ê diyar kir ku çalakî ji aliyê Sîwana Meclîsên Jinên Êzidî ve tên organîzekirin û got, "Divê kesek li mala xwe nemîne. Azadiya Bradostê, azadiya Efrînê û Bakurê Kurdistanê azadiya Şengalê ye."






# Em ê rê nedin ku axa me bê dagirkirin


***Bi dehan endamên Yekitiya Ciwanên Rojava yên ji bajarê Hesekê li dijî dagirkeriya Tirk meşek lidarxistin û dagirkerî şermezar kirin. Ciwanan diyar kir ku çalakiyên wan heta ku hemû herêmên bakurê Sûriyê û başûrê Kurdistanê ji dagirkeriya tirk werin rizgarkirin wê dewam bike.***



Rêxistina Yekitiya Ciwanên Rojava ya Hesekê di çarçoveya qonaxa duyemîn a pêngava "Serî Hilde" de bi meşekê êrîşên dewleta tirk ên li ser başûrê Kurdistanê şermezar .kirin
Bi dehan endamên Yekitiya Ciwanên Rojava yên ji bajarê Hesekê tev li meşa ku li Çerxerêya Itfaiyê (agirkujiyê) bûn. Ciwanan posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û alên Yekitiya Ciwanên .Rojava hildan
Ciwanên ku bê navber dirûşmên li dijî dagirkeriya Tirkiyê berz dikirin, ji çerxerêyê dest bi meşê kir û li kolanên bajarê Hesekê geriyan. Ciwanan bi dirûşmên "Na ji dagirkeriya tirk re, em amade ne ji bo Kurdistanê şer bikin" meşa xwe heta navenda Yekitiya Ciwanên .Rojava dewam kirin
Li vir endamê Yekitiya Ciwanan a Hesekê Sadiq Kobanê axivî û diyar kir ku pêngava wan a "Serî Hilde" wê heta herêmên bakurê Sûriyê û başûrê Kurdistanê ji dagirkeriya tirk .werin rizgarkirin, dewam bike
Paşê li ser navê Yekitiya Jinên Ciwan Nûjîn Îbrahîm axivî û ev tişt anî ziman: "Bi rihê jinên ciwan em ê serî li hemberî dagirkeriyê hildin, em ê tu carî rê nedin dagirkeriya dewleta tirk ku mafên me binpê ".bike
Ciwanan bi dirûşmên "Bijî berxwedana Efrînê" û "Bimire dagirkerî" çalakiya xwe bi dawî kir…*ANHA*

## Em amade ne biçin Qendîlê







Ciwanên Şêxmeqsûdê helwesta Partiya Demokratîk a Kurdistanê û êrîşên dagirkeriya tirk li başûrê Kurdistanê şermezar kirin û diyar kirin ku eger bê xwestin ew amade .ne biçin Qendîlê
Di dema ku dagirkera tirk êrîşan li ser başûrê Kurdistanê û Qendîlê didomîne de, Partiya Demokratîk a Kurdistanê (PDK) deriyê Sêmalka yê di navbera rojava û başûrê Kurdistanê de digire û destûr nade .ku ciwan derbasî Qendîlê bibin
Ciwanên Helebê nêzîkatiyên PDK'ê şermezar kirin diyar kirin ku ew amade ne berê xwe bidin Qendîlê û parastina xaka .Kurdistanê bikin
Diyar Mistefa siyaseta PDK'ê, girtina deriyê Sêmalka, piştgirya kiryarên Erdogan, êrîşa li ser başûr şermezar kir û wiha got: "Em kurd in û ew jî kurd e divê em yek bin, ji ber wê em wek ciwanên Helebê amade ne berê xwe bidin başûr û li hemberî êrîşên li ser gelê kurd ."bisekinin
Mistefa got: "Divê tavilê deriyê sînor bê vekirin. Berxwedana me ."wê li hemberî dagirkeriyê bidome
Ciwanê bi navê Îbrahîm Elo siyaseta PDK'ê şermezar kir û ev pirsî: "Çima tu derî li hember ciwanên Rojava digirî û piştgiriya Erdogan dikî?" û got: "Ev kiryar xiyanet e. Em vê qebûl nakin. Malbata Berzanî kurd in divê parastina xaka Kurdistanê bikin ne li dijî me bise- ."kinin
Ciwanê bi navê Ciwan Hiso siyaseta PDK'ê şermezar kir û wiha got: "Divê Nêçîrvan Berzanî bizane ku ciwanên Kurdistanê ji bo şikandina sînor û ji bo parastina destkeftiyên xwe û mafên xwe yên rewa amadene her tiştekî bikin û canê xwe jî feda bikin."…*ANHA*

## HSM'ê buroya xwe li Helebê vekir

Partiya Sûriya Pêşerojê piştî bajarê Hesekê, buroya xwe li taxa .Şêxmeqsûd a Helebê vekir
Partiya Sûriya Pêşarojê di 27'ê Adara 2018'an bi tevlêbûna hemû pêkhateyên Sûriyê li bajarê Reqayê damezrandina xwe ragihand. Piştre buroya xwe ya yekemîn li babjrê .Hesekê vekir
Partiya Sûriya Pêşerojê buroya xwe ya duyemîn li taxa Şêxmeqsûd li bajarê Helebê bi tevlêbûna nûnerên partî û tevgerên siyasî, endamên saziyên sivîl ên taxê û dehan .şêniyên taxê, vekir
Hevserokê Partiya Sûriya Pêşarojê a taxa Şêxmeqsûd Mihemed Hacî bi xêrhatina beşdaran kir û vekirina buroyê li wan pîroz kir.
Bi navên Partiya Komunist a Sûriya Hevgirtî Riyad Egîd, Partiya Sûriya ya Neteweyeyî û Civakî Îsam Ezûz, Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê (Yekîtî) Ebû Qehreman, Partiya Vîna Gel Ebû Rezan, Buroya Meclîsa Sûriya Demokratîk a Helebê Fehîme Hemo, Hevbendiya Demokratîk a Sûriyê Welîd Nesan û Partiya Yekîtiya Demokratîk Îsa .Mustefa axivîn
Di axaftinan de girîngiya hevgirtina gelê Sûriyê li hemberê dagirkeriya Tirkiyê û komên çete û xebata hevpar ji bo avakirina Sûriyeke ne navendî û demokratîk hate .destnîşankirin
Şirîta buroya ji aliyê Hevserokê Partiya Sûriya Pêşrojê yê Helebê ve hat vekirin…*ANHA*



## Artêşa Tirk xebatên xwe yên kontrayan zêde kiriye



Fermandariya Giştî ya YPG'ê bibîr xist ku êrîşên der mirovî yên artêşa Tirk û komên çeteyên girêdayî wê yên li ser welatiyên sivîl û gelê Efrînê didome. YPG'ê destnîşan kir ku artêşa Tirk û çeteyên wê cilên YPG'ê li xwe dikin û xebatên .kontrayan dikin
Fermandariya Giştî ya YPG'ê, têkildarî êrîş û talanên artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê ya li ser Efrînê daxuyaniyek nivîskî da. YPG'ê di daxuyaniya xwe de da xuyakirin ku artêşa Tirk ji bo dagirkeriya xwe rewa û destekeftiya bide reşkirin, cilên YPG'ê li xwe dikin û li dijî welatiyên sivîl .kiryarên dij mirovahiyê dikin
YPG'ê di dewama daxuyaniya xwe :de bal kişand ser van xisûsan
Artêşa Tirk a dagirker û komên" çete yên girêdayî wê li Efrînê lez da xebatên xwe yên kontra yên bi armanca xapandina gelê Efrînê û hewldanên xwe yên reşkirina tevgera me zêdetir kir. Artêşa Tirk a dagirker bi vê rêyê dixwaze dagirkeriya xwe ya nerewa, rewa bide .nîşandan
Artêşa dagirker û komên çete yên pêve girêdayî, li gel dewamkirina dagirkeriya li Efrînê, ji milekî de jî hewl didin gelê herêmê di bin zext û zordariyê de bigirin da ku bikaribin dagirkeriya xwe bi wan bidin qebûlkirin û rewa nîşan bidin. Artêşa Tirk a dagirker ya ku bi derewa; 'Gelê herêmê di bin zextê de ye'dest bi êrîşan kir, ji bêdengiya navdewletî jî sûd wergirt û di pêvajoya derbasbûyî de her cûre sûcên mirovahî û sûcên şer pêk anî. Bi sed hezaran şêniyên herêmê ji cîhên xwe hatin derxistin, bi hezaran çekdar û malbatên wan yên ji her aliyê Sûriyê li Efrînê de hatin bicihkirin. Gelê Efrînê tevî hemû van polîtîkayên revandin, qetilkirin, û qirkirinê jî dagirkeriya ne rewa ya artêşa Tirk a dagirker nepejirandiye û li hember vê yekê sekna xwe ya berxwedêr doman- .diye
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê weke çareseriya dawî jî serî li rêya reşkirina destkeftiyên gelê me yê li Rojavayê Kurdistan dide û dixwaze van destkeftiyan di nêrîna raya giştî ya navneteweyî de reş bike. Bi vê armancê çeteyên dagirker di hundirê Efrînê de cilê şervanên me li xwe dikin û bi navê YPG zextê li ser gel dikin, mal û milkên wan talan dikin û xebatên kontra dimeşînin. Em bang li gelê xwe yê Efrînê û hemû raya giştî dikin ku li hember van dek û dolaban ".hişyar û baldar bin

## Aloziya Têkeliyên DYA-Tirkiye -1-



Burhan ERDEM

Heta niha tucarî Enqere ji aliyê Washingtonê ve ewqasî nehatiye tehdîtkirin. Herçiqasî girtîbûna rahîbekî li Tirkiyeyê weke sedem were nîşandan jî, di bingeha xwe de, şikestineke ciddî ya têkeliyên DYA û Tirkiyeyê heye. Dîrokîbûna van têkeliyan û kûrbûna berjewendiyên ji hevdû yên aliyan, bi mirov dide gotin ku ewê çareserî an li ser esasê wê menfaetê be, an jî wê rêveberiya Enqerê bide guherîn! Lewra, di dîroka van têkeliyan de, ev hertim bi vî rengî pêk hatiye...
Destpêka nêzîkatiya di navbera Tirkiye û Amerîkayê de, hê di dema Atatûrk de çê bûbû. Ku peyameke namdar a Ataturk ji bo gelê Amerîkî hebû, li sînemayên Amerîkayê dihate pêşkeşkirin. Lê xurtbûna vê têkeliya bi rêveberiya Washingtonê re, rastî salên piştî şerê duwemîn ê cîhanê tê. Di vê demê de, Yekitiya Sovyetan ragihand ku di dema derbasbûna tengavên Çanakkale û Bosforusê de Tirkiye li hemberî wan astengî derxistiye. Ji ber vê astengiyê jî peymana dostaniyê ya sala 1923 yan a bi Tirkiyeyê re careke din nû nekir. Piştî vê pêşketinê rêvebiriya Enqerê berê xwe da rojavayê cîhanê. Vê helwesta Tirkiyeyê di çavên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de ku dest bi şerê sar kiribû pêşketineke erênî bû.
Lewra, cîh û rewşa stratejîk a li rojhilata navîn a Tirkiyeyê, cîrantiya wê ya bi Yekitiya Sovyetan re û dîsa kontrola wê ya li ser Tengavên Çanakale û Stenbolê ji bo Waşîntinê gelekî girîng bû. Ji xwe piştî şer Amerîkayê dest bikampanyayeke navneteweyî ya dijberiya komunîzmê kiribû. Mîmarê vê kampanyayê Serokdewletê hingê yê Amerîkayê Harry Truman bû. Di çarçoveya vê kampanyayê de Kongreya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê tevî Yunanîstanê Tirkiye jî girt nava welatên ku ewê alîkariya wan bikin.
Navê vê plana alîkariyê jî ku gelek dewletên Ewropayê jê sûd wergirtin, alîkariya Marshal bû. Di çarçoveya vê planê de Tirkiyeyê sed milyon dolar alîkariya leşkerî û aborî ji dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wergirt. Şertê vê alîkariyê jî dijberiya Yekitiya Sovyetan bû. Jixwe tevî vê yekê sazkirina qeregaheke li Tirkiyeyê ya bi armanca berterafkirina tehdîtên ji Moskovayê tên armanca sereke ya Washingtonê bû. Kampanyaya dijberiya komunîzmê ku destpêka têkeliyên Tirkiye û Amerîkayê bû, di 50 salên dawîn de hertim bû bingeha têkeliyên van welatan.Tirkiyeya ku bêyî şik û şiphe piştgirvanê Amerîkayê bû, di navbera salên 1950 û 53 yan de ji bo şerê Koreyê leşker şand. Ku di dawiya vî şerî de Kore bû du perçeyan. Bi vê leşker şandinê re jî Tirkiye di sala 1992 an de, ji bo NATOyê weke endam hate qebûl kirin.
Di sala 1955 an de jî Tirkiye bû endamê CENTOyê, ku ev rêxistin xwediyê stratejiya bi îttifaqên herêmî dorpêçkirina Yekitiya Sovyetan bû.Di nava vê rêxistinê de dewletên weke Îran, Pakîstan, Iraq û Brîtanyayê cîh digirt. Bi taybetî li rojhilata navîn ku di salên navbera 1950 û 60 î de dengeyên wê cîhê xwe digirtin, Tirkiye bi Yektiya Dewletên Amerîkayê re di nava hevkariyê de bû. Tirkiye di vê demê de tevî hevkariya Îran, Urdun û Îsraîlê, nehişt ku Yekitiya Sovyetan û welatên ku hingê hevalbendê Sovyetan bûn weke Misir, Iraq û Sûriye li Rojhilata Navîn hêz û bandora xwe bikarbînin. Heta dagerkirina Kibrisê ya ji aliyê Tirkiyeyê ve, di têkeliyên Washington û Enqereyê de krîzeke ciddî nehatibû jiyîn…